

Ji Penûsê Jinê Rastiya Jiyanê

RAPERÎN

Dîrok: Sibat 2023

Hejmar: 07

JIN
JIYAN
AZADÎ.

BIJÎ
BERXWEDAN

اختيار مبارک



المرأة
حياة
حرية
تحييتش
المرأة

NEZERIYE

Desthiladariya Dumend û
Îtifaqa Jin û Mêr

6

سلطة دومند واتحاد النساء والرجال

DOSYE

Ji Dîroka Sûrî Heta Şoreşa
Rojava Nivîsandina
Dîroka Jinê BAAS

4

كتابة تاريخ المرأة من التاريخ
السوري إلى ثورة روج آفا

ROJEV

Jin Jiyân Azadî! Bijî
Berxwedan!

2

المرأة حياة حرة ! عاشت
المقاومة!

Jin Jiyan Azadî! Bijî Berxwedan!

Li tevahî cîhanê jin li dijî sîstema kapîtalîst ji bo wekhevî û azadiyê li kolanan in. Jinên kuli mal, li kargehan rastî kedxweriyeke mezin tî di nav berxwedan û girêvê de ne. Jinên ku pêşengên têkoşîna edalet û mafê ne bi her awayî di nav çalakiyê de ne. Jinên dîlgirtî yê polîtîk dîwarên zindanan derbas dikin û bi vî û biryardariyeke mezin têkoşîna xwe berdewam dikin. Şervanên jin ên şoreşger û komûnîst di her cepheyê de bi fidakariyeke mezin destanên berxwedanê dinivîsin. Êdî tu hêz nikare jinan mekkûmî jiyaneke koletî bike. Tevera jin weke çeman mezin dibe, tundiya têkoşîna xwe zêde dike, zinarên herî asê derbas dike û bi hedefa gîhaştina deryayên mezin berdewamî rêya xwe dike. Roj a me ye, pêşeroj a me ye!

Bijî 8'ê Adar e!

Em di bin êrişên dagirkerî û gefên şer de ji zivistanê heta biharê nêzikî rojên dîrokî yê berxwedanê dibin. 8'ê Adarê bi derfetên mezin ên azadbûna jinê li benda me ya jinên komûnîst e. Şoreşa me ya Rojava, hêviya serkeftina têkoşîna azadiya jin di destê jinên Kurd, Ereb, Fars, Suryan, Ermen û jinên ji netewên din de dike al û dihejîne. Berxwedana jinên Rojhilatî yê Kurd, Fars, Azerî û Belûcî ku bînavber berdewam dike careke din rastiya perspektîfa şoreşa jin rojaneyiya vê dide ber çavan. Piştî Rojava ji bo şoreşê jin a ya nû Rojhilat bi her tiştê xwe amade ye. Lê mixabin hîna rêbertiyeke hevbeş ku serkeftina şoreşê misoger bike derneketiye holê. Divê tevahî jinên ku li Rojhilat û Îranê di nav serhildanê de cihê xwe digirin li ser pêşxistina vîneke hevbeş a jinê kûr bibin. Di vê qonaxê de erka herî girîng a serhildana jin û serhildana gel a Rojhilat ev e.

Êrişên dewleta Tirk li çar parçeyên Kurdistanê û li her derê berdewam

in. Di van êrişan de bi taybetî pêşengên jin tî hedefgirtin. Li Başûrê Kurdistanê bi hedefgirtina Nagehan Akarsel, Li Parîsê bi hedefgirtina Evîn Goyî, li Bakurê Kurdistanê bi hedefgirtina pêşengên jin ên Kurd, komûnîst û sosyalîst ev êriş li her derê berdewam in. Êrişên dewleta Tirk bi taybetî li tevahî Kurdistanê sînorên hovitiyê derbaskirine. Li qadên parastina medyayê bikaranîna sîlehên kîmyevî sînorên vê hovitiyê careke din da ber çavan.

Li Rojavaya ku şoreşa jin tê de jiyana dike jinên komûnîst wê bi hêz û cesareta erkgirtina ser milên xwe amadekariya 8'ê Adarê roja jinên kedkar ên cîhanê bikin. Hedefa sereke ya dewleta Tirk a ku nûnerê baviksalarî û feraseta paşverû ya zilamperestiyê ye, tunekirina destkeftinên ku gelê Kurd bi saya şoreşê bi dest xistiye û tunekirina azadiya neteweyî ye. Rêya vê jî tesfîyekirina Rojava, Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûrî ye. Di aliyê din de em weke jin dizanin ku dewleta Tirk di heman demê de ji bo tesfîyekirina şoreşa me ya jin û şerê çopandina destkeftinên me ev şerê qirêj dide meşandin. Di vê wateyê de parastina şoreşa Rojava û parastina şoreşa jin heman erk in.

Hebûna rêxistinîkirî ya jinan di tevahî jiyana civakî de destkeftineke gelekî girîng e. Mafên jinan hemwelatîbûna wekhev gelekî girîng e. Guhertinên ku di zagonên medenî de hatine kirin û avakirina hevpeymanê civakî ya ji aliyê jinê de qewastineke mezin e. Destkeftinên li dijî zewaca di temenê zarok de, zewaca zêde û tundiya li dijî jinê gelekî girîng û binirx in. Parastina şoreşa jin tê wateya parastina van destkeftinan.

Lê pîrgêkeke me wiha heye ku; Li Rojava di navbera asta azadbûna jinê ya ku hatiye qezenckirin û di navbera zanebûna azadiyê ku her jinekê



qezenç kiriye mesafetek heye. Di nav jinên me yê Kurd, Ereb, Ermen, Suryan, Tirkmen de hîna zanebûna destkeftinên şoreşê teşe negirtiye. Lê ger em deskeftinên xwe yê şoreşa xwe weke şênber fêhm nekin em nikarin wateya şoreşa xwe jî fêhm bikin. Elbet hîna gelek kar û erk li pêş me ye. Di milê bi cihanîna zagonên şoreşê de pîrgêrekên cidî hene. Li dijî şoreşa me ya jin berxwedaneke xurt a feraseta kevin a avahiya civakî û pîvanên exlaqa feodalî heye. Hîna zagonên eşîrtî bi temamî ji holê ranebûye. Îro di nav civaka me de tundiya li ser jinê, her wiha rêbaza kuştin û HDD. berdewam dike. Di demên nêzik de jî ev mînak hatin jiyîn. Lê rêxistinbûn û zagonên ku em pişt a xwe bidin hene.

Azadiya jinê tena ne di bin gefa êrişên dewleta Tirk a dagirker û dewletên din ên ku bi wê re di nav hevkarîyê de ye. Berdewamiya feraseta bavikalarî û feraseta paşverû a mêr jî li ser şoreş û destkeftinên me gegeke din e. Li Rojava, Bakur û Rojhilatê Sûrî ku axa şoreşê ye feraseta serdestiya mêr bandora xwe hîna berdewam dike. Jinên ku li derve û jiyana civakî de azadiya xwe qezenç kirine dema ku vedigerin malê dîsa dikevin bin siltatiya feraseta kevneşopî ya serdestiya mêr. Azadiya jinê ya zayendî hîna nehatiye misogerkirin. Di vî milî de li pêş me hîna

têkoşinên mezin ku em bidin meşandin hene.

Li dijî gefên dagirkerî û şerê mêtînger parastina şoreşa xwe bangawaziya bingehîna 8'ê Adarê ye. Ligel vê pêşxistina zanebûna azadiyê erka sereke ya jinên komûnîst ên şoreşger in. Ev naverok hedefa bingehîna a xebata me ya pêvajoya 8'ê Adarê ye. Ji bo parastina şoreşê pêşketina jinan û pêşengtiya jin a berxwedanê misogeriya serkeftinê ye. Li dijî hewldanên feraseta zilamperest a paşverû ku dixwaze jinan ji nû ve bi zincîra koletiyê ve girê bide misogeriya me pêşxistina zanebûn û azadiyê û pêşengtiyê ye. Ji kîjan alî ve tê bila were li dijî tevahî êrişan parastina destkeftinên xwe û bi pêşxistina şoreşê ber bi wekhevîyeke rast ve girêdayî rêxistinbûna jinan e. Hedefa me rêxistinbûn, pêşengbûn û azadbûn e.

Em di şexsê rêheval Îvana Hoffmann de tevahî rêhevalên xwe yê enternasyonal û tevahî jinên ku li dijî hovitiya kapîtalîzmê agirê serhildanê geş kirin û berê xwe dan şoreşa me û di vê rêyê de bûn nemir careke din bi bîr tînin.

Em 8'ê Adara tevahî jinên cîhanê yê kedkar pîroz dikin. Li Rojhilata Navîn û cîhanê wê têkoşîna enternasyonal a jinan bi ser bikeve. Wê cîhaneke nû bê avakirin.

Ji Dîroka Sûrî Heta Şoreşa Rojava Nivîsandina Dîroka Jinê

Ger em li ser dîroka siyasî ya Sûrî lêkolînekê bikin li ser dîroka tevgera jinê dîtina daneyan gelekî zehmet e. Di çavkaniyên nivîskî de navê jinê tune ye. Weke tevahî dîrokên pergalekê kapîtalîst ên baviksalar, ferweriya serdestiya mêr heye. Nûnerên fikra şoreşger, komûnîst, demokrat û çep hem ji ber tundî û tadeya rejîmê, hem ji ber dûrbûna têkoşîna azadiya jin berê xwe nedane nivîsandina dîroka jinê. Hejmara jinan her çiqasî ku di nav van rêxistinên de zêde bibe jî vîneke jin a xweser derneketiye holê. Di bernameya BAAS a siyasî de bendên weke mafa jinê ya hatin hilbijartin û dengdan, mafa soz û çalakî û rêxistinbûnê derbas dibin. Lê mafa azadiyê her tim di bin tundî û tadeyê de hatine girtin. Mafên ku resmî di bername de derbas dibin jî bi rê û rêbazên cuda hatine qedexekirin.

Dewleta bûrjûwa û baviksalar a netewperêziya Ereba BAAS di destpêkê de sistemeke siyasî, îdeolojîk ku rêxistinbûna tevgera jin ku ji xwe bawer asteng dike ava kiriye. Li gorî çîna, netew û mezheban parçekirina jinan weke siyaseteke bingeşîn sepandiyê. Di nav jinan de ji ber pirsgêrêkên kêmbûna piştgiyaya zayendî yekîtiyeye siyasî an jî tevgera jinan ji ber pirsgêrêka tunebûna rêbertî û pêşengtiya şoreşger pêk nehatiye. Her çiqasî ku tundiya dewlet û zîlam li ser jinê were ferzkirin, jî li dijî vî zanebûna têkoşîneke zayendî pêş neketiye.

Li dijî mêtîngerîya Fransayê di salên 1960'an de li Şam, Hama û bajarên din serhildanên îslamî yê polîtîk pêk tên. Jin di van serhildanan de bi awayekî girseyî cihên xwe digirin. Dîsa di şerê li dijî Îsraîlê de jin cihê xwe digirin. Lê di van şeran giştî de jin li paş cephe, lojîstîk û HWD. cih digirin.

Mafa dengdan û hatin hilbijartinê de di salên 1947'an de tê bi dest

xistin. Di salên 1980'ê de di çavkaniyên BAAS' de agahiyek heye ku hejmara yekîtiya jinan a girêdayî partiya BAAS 110 hezar e. Lê li vir xaleke bingeşîn heye. Çi jin be, çi zîlam be ger nebe endamê partiya BAAS nikare di tu sazî an jî cihan de bixebite. Ji ber vî yekê kesê ku dixwaze bixebite mecbûr e bibe endamê partiya BAAS. Jin bi taybetî ji bo mafa xwendinê dest bi çalakiyan dikin û di dawiya van çalakiyan de mafa xwendinê bi dest dixin. Yanê em dikarin bêjin ku ji destpêka avabûna Sûrî heta pêvajoya şoreşa Rojava her çiqasî ku hinek rêxistin û têkoşînên jinan hebin jî weke tevgera girsayî ya jinan ku hem li dijî kapîtalîzmê hem jî li dijî serdestiya mêr têkoşîn dike derneketiye. Partiyên şoreşger û komûnîst her çiqasî ku di bername û gotinên xwe de cih bidin mafên jinan jî di esasê de dîrî nêrîna şoreşa jin in û di esasê de di hundirê van partiyan de nêrînen zîlamperest serdest in. Ji ber vî her çiqasî ku hejmara jinan di nav van partiyan de zêde bibe jî ne xwedî wê fikrê ye ku rêxistina jinan li derdora fikra têkoşîna jin a çîna û zayendî rêxistin bike.

Bi Şoreşa Rojava Ya Jin re Rûpeleke Nû

Dîroka têkoşîna azadiya jin encax bi rêxistineke bîrdozî û siyasî dikare bê nivîsandin. Ji ber vî yekê tevgera jinên Sûrî nikarîbû di vî xetê de rêxistinekê derxîne holê. Em dikarin bêjin raperîna jinan ayekem li dijî rejîm û desthiladariya mêr bi tevgera jinên Kurd ve gengaz bû. Têkoşîna ku jinên Kurd derxistin holê bi wateya peyvê ya kamil ronakbûneke jinê afirand. Têvgera Jinên Kurd li vir pêşengtiya rêxistinîkirina têkoşîna zayendî ya jinên ji netewên din jî kir. Gelê Rojava bi pêşengtiya jinan hem şoreşeke demokratîk pêk anîn, hem jî pergaleke azadiya jin avakirin. Piştî pêkhatina

şoreşê jinan di qadên leşgerî, parastin, xebatên civakî, çand, dîplomasî û qadên rêveberiyê de rêxistinên xweser ên jinan avakirin, îlankirin û gavên girînk avêtin. Di tevahî sazîyên şoreşê de sistema hevserokatiyê hat xistin meriyetê. Bi avabûna YPJ'ê re li Rojhilata Navîn hêviya azadiyê mezin bû.

Li Sûrî Dîroka 8'ê Adarê

Li Piştî şoreşa Rojava ya ku mohra xwe li 11 salên dawî xist çanda têkoşîn û berxwedana 40 salan heye. Li Rojava zanebûna berxwedana jin di salên 1980'an de destpê dike. Her çiqasî ku pîrozbahiyên 8'ê Adarê di salên 1950'an de bîna lidarxistin jî, ji vir zanebûn û rêxistineke têkoşîna azadiya jin dernakeve holê. Piştî wan salan 8'ê Adarê cara yekem di sala 1987'an de li Qamişlo bi awayekî veşartî tê lidarxistin. Ev bingeşa rêxistinbûna jinên Kurd xurt dike. Pîrozbahiya girseyî ya yekem jî di sala 2005'an de li gundê Qamişlo ya Terteb tê lidarxistin. Hêzên rejîmê êrişê vî çalakiyê dikin û li vir jina bi navê Nazliye Keçel tê binçavkirin û windakirin. Piştî komkujiya Qamişlo di sala 2005'an de jinên ku li Rojava tên gel hev rêxistina Yekîtiya Star tê avakirin. Bi vî awayî şoreşa jinê gav bi gav tê rêxistinîkirin.

Di vî pêvajoyê de jinên pêşeng rastî êrişên rejîmê tên. Piştî şoreşa Rojava di hevpeymana civakî de 8'ê Adarê wek bedlana bi mûçe tê îlankirin. Ev destkeftineke girîng e. Ji ber ku niha di tevahî cihanê de tevgerên jin ji bo vî mafê têkoşîn dikin û bedelên mezin didin. Jinên Rojavayî bi têkoşîna xwe her roj zivirandin 8'ê Adarê. Di sala 2016'an de rêxistina siwan a Yekîtiya Star kongreya xwe 6'emîn lidar xist û navê Yekîtiya Star weke Kongre Star hat guhertin. Piştî şoreşa 19'ê Tirmehê di sala 2013'an de li kantonên

Efrîn, Kobanê û Cîzîr bi îlanbûna Rêveberiyên Xweser jinan xebata xwe berfirehtir kirin. Li Efrîn, Kobanê û Cîzîr jin cara yekem di roja 8'ê Adarê de bê qedexe derketin kolanan. Piştî rizgarbûna Minbic û Tebqa jinan hîcabên reş şewitandin û şervanên YPJ'ê tîlîliyên xwe pêşwazî kirin. Li van bajarên 8'ê Adara yekem di salên 2017'an de hat pîrozkirin. Cihê ku cara yekem tê de 8'ê Adarê hat pîrozkirin jî Reqa bû.

Pêkhatiya Komûnîst a Dîroka Jinê; JKŞ

Ji destpêka şoreşê de heta niha jinên komûnîst bi awayekî çalak tevî şoreşê bûn. Di qada civakî û polîtîk de weke SYPG, SYPG Jin, Jinên Azad ên Sosyalîst (JAS) û herî dawî bi navê Jinên Komûnîst ên Şoreşger (JKŞ) cihê xwe girtin.

Di qada leşgerî de jinên komûnîst di destpêkê de di nav YPJ'ê de, di avakirina pêvajoya YPJ'ê de, di tabura enternasyonal de weke MLKP/KKÖ Rêxistina Jinên Komûnîst cihê xwe girtin û tevî tevahî hamleyên rizgarkirina Rojava bûn. Di qada civakî de ji qada tendurîstî heta ragihandin, şaredarî, komîn, meclis, xweparastin, Asayîş cihê girtin û kedeke mezin dan. Jinên komûnîst ên ku di her şerê bajar û herêman de cih girt şehîd, gazî û birîndar dan. Ew bûn pêkhateyeke artêşa jin. Ji qada sîiqest heta sabotajê, ji beşa sîlexên giran heta her qadê jinên komûnîst bûn kirdeya şoreşa jin. Di şerê Şengal, Efrîn, Kobanê Kantona Cîzîr de jin û LGBTI'yên komûnîst bi rihekî fidayî cih girtin. Weke JKŞ ji Kobanê heta Dirbêsiyê, ji Heseke heta Til Temir û Qamişlo di nav jinên kedkar de kar û xebata rêxistinbûnê meşand û keda cihgirtina jinan di nav refên şoreşê de ked dan.

Jinên komûnîst niha jî bi awayekî kedkar, wêrek vî kar û xebata xwe bi coş û rûmeteke berdeyam dike

Desthiladariya Dumend û Îtîfaqa Jin û Mêr

Dema ku desthiladarî tê gotin bêguman her tim desthiladariyên pergala kapîtalîzmê, pergala baviksalarî tê bîra mirov. Lê ji destpêka civakên biçîn heta îro şerê desthiladariyê her tim di navbera bindest û serdestan de qewimiye. Li vir bindest tevahî gelên bindest çîna kerkeran, zayandên bindest, serdest jî çîna bûrjûwaziyê vedibêje. Çînen serdest ên bûrjûwaziyê qasî ku hebûna xwe li ser destesarkirina keda çîna karkeran û bindestan ava dike, lingekî avahiya xwe jî li ser feraseta baviksalarî ava dike. Yanê li vir em dikarin bêjin ku îro esasa têkoşîna me ya çîni qasî têkoşînen çîni û netewî ew qasî jî zayendî ye. Bêyî kêmbûna yek ji van esasan, bingeha têkoşîna û şerê li dijî kapîtalîzmê kêmbûnê û encama serkeftinê kêmbûnê dibe. Ev yek dibe sedema hilweşîna şoreşê. Di dîrokê de gelekî mînakên vê hene.

Di bingeha avakirina pergala biçînê kapîtalîzmê de malbat û milkê taybet esasên herî bingehîn in. Milkê taybet serdestiya li ser kedê, malbat jî serdestiya zilam li ser jinê temsîl dike. Malbat dendika saziya dewletê ya herî bingehîn e. Bi avabûna malbatê ve, rolên civakî jî tîndar xuyakirin. Li gorî van rolan serdestî tevahî jiyana mêr e, jin jî bi çand, bi adet û teqelîdan û bi her şewezê jiyana xwe li gorî vê rastiyê rêxistin dike. Bi avabûna malbatê cihan dibe mala mêr, mal dibe cihana jinê û çar dîwarên malê jî jinê re dibe heps. Di dîrokê de binketina jinê ya yekem bi avabûna malbat û derketina milkê taybet dest pê dike. Îro jî di tevahî cihanê de pergala kapîtalîzmê desthiladariya xwe li gorî vê rastiyê dide meşandin.

Şerên di navbera Bindest û Bûrjûwaziyê de

Li dijî vê ji destpêka dîrokê heta îro di navbera çînen bûrjûwazî, proleterya û bindestan de şerên gelekî meşandin. Hinek gîhaştin serkeftinê, hinek bi awayekî

bixwin hatine tunekirin. Aliyek ji vê şer û têkoşîna jinan bû. Jinan di dîrokê de li dijî pergala kapîtalîzmê ya baviksalarî têkoşînen gelekî mezin dan meşandin û ligel vê, destkeftinên gelekî mezin bi dest xistin. Çawa ku proleterya û bindest li dijî bûrjûwaziyê têkoşîna desthiladariyê didin meşandin, jin û zayandên bindest du caran têkoşîna desthiladariyê didin meşandin. Yek têkoşîna têkoşîna çîni ya li dijî kapîtalîzmê, duyem têkoşîna li dijî baviksalarî ye. Ev her du têkoşîna jî bo ku bigêhêje serkeftinê pêwîst e bi hev re bînd meşandin. Ji ber ku heta ku jin azad nebe, proleterya jî nikare rizgar bibe, lê heta ku proleterya rizgar nebe zayandên bindest jî nikarin rizgar bibin. Ji ber ku qasî bindestî û koletiya jinê koletî û bindestiya proleterya û netewên bindest jî pîrsgêrêkên kapîtalîzmê yê hebûnî ne. Yanê heta ku kapîtalîzm û feraseta wê ji kok de nayê hilweşandin ev pîrsgêrêk bi tu awayî çaresar nabe. Bingehe kapîtalîzmê li ser van nakokiyên hatiye avakirin. Hebûna kapîtalîzmê jixwe li ser van esasan e. Ev mijar çaresar bibin jixwe kapîtalîzm tune dibe. Rêya vê ya tekena jî sosyalîzm û komûnîzm e. Komûnîzm qonaxa sosyalîzmê ya herî bilind e.

Desthiladariya Dumend

Dema ku proleterya li dijî kapîtalîzmê bi ser bikeve pêwîst e xwedî bernameyê azadîxweziya jinê bibe. Yanê wateya desthiladariya dumend ew e ku; rastênhevê desthiladariya proleterya û bindestan desthiladariya zayenda jin û tevahî zayandên bindest tê avakirin. Hebûn û mafên jinê li ser esasa xweseriya jinê tê misogerkirin. Qasî zagon, rêzîkname û bernameya şoreşa jinê di saziyan de, di tevahî jiyana civakî de têkoşîna li dijî feraseta baviksalarî ku koletiya jinê kurtir dike têkoşîna tê meşandin. Ew rolên civakî yê weke kar û barên malê, xwedîkirina

zarokan, xizmeta zilam di desthiladariya dumend de dibe karê civakî. Tevahî ew sînorên ku bûne koletiya jinê ji holê tên rakirin. Di milê siyasî de weke ku îro li Rojava tê jiyankirin jin dibe şîrkê rêveberiyê.. Ya herî girîng jin li ser jiyana xwe, bedena xwe, pêşeroja xwe dibe xwedî soz.

Îtîfaqa Jin û Mêr

Ev mijar qasî ku mijara têkoşîna jinê ye, ew qasî jî mijara têkoşîna mêrên komûnîst e. Çawa ku tevahî bernamûca şoreşê rojava jinên komûnîst e, bernamûca şoreşa jin jî mijara têkoşîna mêrên komûnîst e. Îtîfaqa proleterya, jin û mêran destpêkê ji vir ve dest pê dike. Mînak têkoşîna li dijî çanda malbatî, eşîrtî û civakî ku hebûn û vîna jinê tune dike destpêkê de divê bibe mijara mêrên komûnîst. Pêwîst e her şoreşgerek, her komûnîstek têkoşîna sereke ji şexsiya xwe ve destpê bike. Ger keseyatek şoreşger ew imtiyazên ku bi saya pergala kapîtalîzmê bi dest xistiye bi esasî ji dil ve red neke tu bawerdêriya xwe namîne. Li dijî pergala kapîtalîzmê ya baviksalar ku ji bo hîna zêdetir fêda xwe, dawî li mirovatiyê tîne, hebûn û nasnemeya netewan, ciwanan, jinan û her zindiyekî tîne rêya tekena sosyalîzm û komûnîzm e. Demokratî tenê tere hilweşandina kapîtalîzmê nake. Ji ber ku kapîtalîzm li ser amûrê dewletê hatiye avakirin. Dewlet bi xwe amûrê zorê ye. Dewleta karker û kedkaran jî bibe ger ku ber bi sîtemeke bêsinor û bêçîn ve neçe xizmetî berjewendiya karker û kedkaran nake. Ji ber vê yekê ji bo tunekirina kokên kapîtalîzmê şoreşa proleterya di merkeza şerê çîna karkeran disekine. Îtîfaqa şoreşa proleterya ya sereke jî zayenda jin e. Divê proleterya ku niviyê wan jî jinan pêk tên şoreşa civakî û şoreşa jin rastênhev bidin meşandin. Li vir jî îtîfaqa şoreşa jinê ya sereke jî zayenda mêr e. Erka herî girîng ya komûnîstan bi taybetî komûnîstên mêr jî

ev mijar e. Rêberên me yê komûnîst Baran Serhed û Ehmed şoreş mînakên vê têkoşîne de. Rêhevalê rêber Baran Serhed di axaftineke xwe de bangawazî ji zilaman re dikir û wiha digot "Şoreşa Rojava şoreşeke jinê ye jî, hevalên zilam biguherin, xwe biguherînin ku şoreşa me hîna pêş bikeve." Rêhevalê rêber Ehmed Şoreş jî wiha digot "Pîrsgêka koletiya jinan a hezar salan yek ji mijarên qeyranê kapîtalîzmê ya hebûnî ye, ger ku komûnîst bi rastî karibin bibin partiyekî jinê wê demê dikarin şoreşa proleterya bi ser bixin." Em dizanin ku ev nakokiyên pergala baviksalar ku jin û zilam jiyana dîkin wê heta qonaxa komûnîzmê berdewam bike. Rastiya ku vê rewşê ji kok de çaresar bike komûnîzm e. Divê em mezinkirina têkoşîna xwe bi hîna zêdetir kûrbûyîna li ser nezeriya şoreşa jin rêya komûnîzmê nêzîktir bikin. Ev bi hêza rêxistinî ya têkoşînkirina li dijî her cure feraseta serdestiya mêr gengaz dibe.

Encam:

Şoreşa Rojava ya jin jî bo têkoşînen tevahî jinên cihanê mînak e. Li Rojava jinan azadiya xwe ya polîtîk û siyasî bidestxistin, lê hîna weke civakî azadiya zayendî bi dest nexistiye. Bêguman ev destkeftin bi saya berxwedaneke bêhempa çêbûn. Bi saya ev berxwedaniya jinan li vir dîroka sed salan hat guhertin. Lê ev şoreş hîna xilas nebûye. Li gorî tevgera dîyalektîkê şoreş gav bi gav çêdibe û ev çêbûn tu carî nasekine. Di aliyekî de feraseta zilamperest a civakî bi awayekî pir xurt berdewam e, di aliyê din de hîna nakokiyên bingeheke civakî, çîni çaresar nebûne. Ev jî girêdayî nakokiyên çîni ne. Nakokî û bandora eşîrtî, malbatî bi hemû hebûna xwe berdewam e. Şoreşê qonaxa yekemîn a demokratîyê tamam kir, niha li benda qonaxa duyemîn e. Qonaxa duyemîn jî êdî çaresarkirina nakokiyên çîni ne.

المرأة حياة حرة ! عاشت المقاومة!

التركية الفاشية والدول الأخرى التي تتعاون معكم. إن استمرار العقليّة الأبوية والعقليّة التراجعية للرجل هو تهديد آخر لثورتنا وإنجازنا في غرب وشمال وشرق سوريا ، وهي أرض الثورة ، لا يزال مفهوم الهيمنة الذكورية يحطى بتأثيره. النساء اللواتي حصلن على حريتهن في الخارج وفي الحياة الاجتماعيّة ، عند عودتهن إلى المنزل ، يخضعن لقاعدة المفهوم التقليدي للسيطرة الذكورية. لم يتم ضمان الحرية الجنسيّة للمرأة بعد. في هذا البلد ، لا يزال أمامنا صراعات كثيرة. إن الدفاع عن ثورتنا ضد تهديدات الغزو وحرب العدوان هو نداء ٨ آذار الأساسي. إلى جانب ذلك ، فإن تطوير معرفة الحرية هو المهمة الرئيسيّة للمرأة الشيوعيّة الثوريّة. هذا المحتوى هو الهدف الرئيسيّ لعملنا لعمليّة ٨ مارس. من أجل حماية الثورة ، فإن تطور المرأة وقيادتها للمقاومة هو ضمان النجاح. مقابل جهود المفهوم الذكوري الرجعي الذي يريد ربط النساء بالعودة إلى سلسلة العبوديّة ، فإن ضماننا هو تطوير المعرفة والحرية والقيادة. يعتمد على تنظيم النساء لحماية إنجازاتهن من كل الاعتداءات من أي جانب ولتعزيز الثورة نحو المساواة الحقيقيّة. هدفنا هو التنظيم والقيادة والحرية. نتذكر كل رفاقنا العالميين في شخص الرفيق إيفانا هوفمان وجميع النساء اللواتي أشعلن نار التمرد علي وحشية الرأسماليّة وانضموا إلى ثورتنا واصبحوا خالدين علي هذا النحو.

نحتفل بيوم ٨ مارس لجميع النساء العاملات في العالم. إن النضال الدولي للمرأة سينتصر في الشرق الأوسط والعالم. سيتم بناء عالم جديد.

سوريا. من ناحية أخرى ، نحن كنساء نعلم أن الدولة التركيّة تشن هذه الحرب القذرة في نفس الوقت للقضاء على ثورتنا النسائيّة وتدمير إنجازاتنا. بهذا المعنى ، فإن حماية ثورة روج آفا وحماية ثورة المرأة هما نفس الواجبات.

بعد الحضور المنظم للمرأة في الحياة الاجتماعيّة بأكملها إنجازاً مهماً للغاية. حقوق المرأة في المواطنة المتساوية مهمة للغاية. إن التغييرات التي تم إجراؤها على القوانين المدنيّة وإنشاء تحالف اجتماعي من قبل المرأة هو إنجاز كبير. إن الإنجازات التي تحققت ضد زواج الأطفال والزواج القسري والعنف ضد المرأة مهمة وقيمة للغاية. إن الدفاع عن ثورة المرأة يعني الدفاع عن هذه الإنجازات. لكن لدينا سؤال: في روج آفا ، توجد فجوة بين مستوي حرية المرأة الذي تم تحقيقه ومعرفة الحرية التي اكتسبتها كل امرأة بين نساءنا الكرديّات والعربيّات والأرمن والسوريّات والتركمانيّات ، لم تتبلور بعد معرفة إنجازات الثورة. لكن إذا لم نفهم اكتشافات ثورتنا على أنها ملموسة ، فلن نفهم معنى ثورتنا. بالطبع ، لا يزال أمامنا الكثير من العمل هناك تساؤلات جدية حول تطبيق قوانين الثورة. هناك مقاومة قوية ضد ثورتنا النسائيّة للمفهوم القديم للبنية الاجتماعيّة والمعايير الأخلاقيّة الاقطاعيّة. لم تلغ القوانين القبليّة بالكامل بعد. يوجد اليوم في مجتمعنا عنف ضد المرأة ، وكذلك طريقة للقتل و HDD. إنها تستمر. تم اختبار هذه الأمثلة أيضاً في الأونة الأخيرة. لكن لدينا تنظيمات وقوانين نعتمد عليها. إن حرية المرأة ليست الوحيدة التي تتعرض للتهديد من هجمات الدولة

في جميع أنحاء العالم ، تتظاهر النساء في الشوارع ضد النظام الرأسمالي من أجل المساواة والحرية. النساء اللواتي يواجهن الكثير من العمل الشاق في المنزل وفي مكان العمل يكونن في حالة مقاومة وقمع. إن النساء اللاتي هن زعيمات النضال من أجل العدالة والحقوق يشاركن في العمل بكل الطرق. النساء المسجونات سياسياً يعبرن جدران السجون ويواصلن نضالهن بإزادة وتصميم كبيرين. المقاتلات الثوريّات والشيوعيات يكتبن ملاحم المقاومة مع تصحيحات كبيرة على كل الجبهات. لا توجد قوة تستطيع إجبار النساء على عيش حياة العبوديّة. الحركة النسائيّة تنمو كالنهر ، وتزيد من حدة نضاله ، وتعبر أشد الصخور ، وتواصل طريقها بهدف الوصول إلى أعظم البحار. الشمس لنا ، المستقبل لنا!

يعيش الثامن من مارس! إننا نقرب من أيام المقاومة التاريخيّة في ظل هجمات الغزو والتهديدات بالحرب من الشتاء إلى الربيع. ٨ مارس تنتظرنا نحن النساء الشيوعيّون بفرص كبيرة لتحرير المرأة. ثورتنا في روج آفا ترفع العلم وتهز الأمل في نجاح النضال من أجل حرية المرأة بأيدي الأكراد والعرب والقارسيين والسوريّين والأرمن ونساء من دول أخرى. إن مقاومة النساء الكرديّات والفارسيّات والأدريات والبلوشيّات ، والتي تستمر دون انقطاع ، تسلط الضوء مرة أخرى على حقيقة منظور الثورة النسائيّة. بعد روج آفا ، أصبح الشرق جاهزاً بكل شيء لثورة نسائيّة جديدة. لكن لسوء الحظ ، لم تظهر بعد قيادة مشتركة لضمان نجاح الثورة. يجب على جميع نساء الشرق والدول الأخرى في إيران اللواتي يشاركن في الانتفاضة التركيز على تنمية روح مشتركة للمرأة. في هذه المرحلة ، هذه هي أهم مهمة للانتفاضة النسائيّة وانتفاضة الشعب في الشرق.

تستمر هجمات الدولة التركيّة الفاشية في أربعة أجزاء من كردستان وفي كل مكان. وتستهدف القيادات النسائيّة بشكل خاص في هذه الهجمات. في جنوب كردستان باستهداف ناكيهان أكارسيل في باريس باستهداف إيفين جوي في شمال كردستان من خلال استهداف القيادات النسائيّة من الأكراد والشيوعيّين والاشتراكيّين ، تستمر هذه الهجمات في كل مكان. تجاوزت هجمات الدولة التركيّة ، وخاصة في كردستان بأكملها ، حدود الوحشية. إن استخدام الأسلحة الكيميائيّة في مناطق حماية الدفاع المشروع قد أبرز مرة أخرى حدود هذه الوحشية. في روج آفا ، حيث تعيش ثورة النساء ، ستستعد النساء الشيوعيّة ليوم ٨ مارس ، يوم المرأة العاملة في العالم ، بقوة وشجاعة لتحمل المسؤوليّة. الهدف الأساسي للدولة التركيّة ، التي تمثل مفهوم الذكورة الأبوي والمتخلف ، هو تدمير الإنجازات التي حققها الشعب الكردي بفضل الثورة وتدمير الحرية الوطنيّة. طريقة القيام بذلك هي القضاء على روج آفا ، الإدارة الذاتيّة لشمال وشرق



كتابة تاريخ المرأة من التاريخ السوري إلى ثورة روج آفا

والإدارة. تم تطبيق نظام القيادة المشتركة في جميع مؤسسات الثورة. مع إنشاء YPJ، نما الأمل في الحرية في الشرق الأوسط.

٨ آذار في سوريا خلف ثورة روج آفا، التي تركت بصماتها على مدى السنوات الـ ١١ الماضية، هناك ثقافة النضال والمقاومة على مدى ٤٠ عامًا. في روجا، بدأت المعرفة بمقاومة المرأة في الثمانينيات. على الرغم من أن احتفالات ٨ آذار أقيمت في الخمسينيات من القرن الماضي، إلا أن المعرفة وتنظيم النضال من أجل حرية المرأة لم يبرز من هنا. بعد تلك السنوات، تم احتجاز ٨ آذار / مارس سرا في القامشلي لأول مرة عام ١٩٨٧. هذا يقوي أساس التنظيم النسائي الكردي. أقيم أول احتفال جماعي في القامشلي بترتيب عام ٢٠٠٥. هاجمت قوات النظام هذا النشاط واعتقلت امرأة اسمها نازلية كيشيل ثم اختفت. بعد مجزرة قامشلي عام ٢٠٠٥، أسست النساء اللاتي اجتمعن في روج آفا منظمة ستار يونيون. بهذه الطريقة، يتم تنظيم ثورة النساء خطوة بخطوة. في هذه العملية، تتعرض النساء القيادات للهجوم من قبل النظام. بعد ثورة روج آفا، أعلن يوم ٨ آذار / مارس عطلة مدفوعة الأجر في الاتفاقية الاجتماعية. هذا إنجاز مهم. لأن الحركات النسائية الآن في جميع أنحاء العالم تناضل من أجل هذا الحق وتدفع ثمنًا باهظًا. تحولت نساء روجا إلى ٨ مارس كل يوم في نضالهن. في عام ٢٠١٦، عقدت المنظمة المظلة Star Union مؤتمرها السادس وتم تغيير اسم Star Union إلى Star Congress. بعد ثورة ١٩ يوليو ٢٠١٣، في كانتونات عفرين وكوباني والجزيرة، وسعت النساء نطاق عملهن بإعلان الإدارة الذاتية. في عفرين وكوباني والجزيرة، خرجت النساء إلى الشوارع لأول مرة في ٨ آذار دون أي قيود. بعد تحرير منبج والطبقة، أحرقت النساء حجابهن الأسود، وتسلم مقاتلو وحدات حماية المرأة مشاعلهم، واحتفلت هاتان المدينتان بأول ٨ آذار / مارس ٢٠١٧. المكان الذي تم فيه الاحتفال به ٨ آذار لأول مرة هو الرقة.

المكون الشيوعي لتاريخ المرأة JKŞ منذ بداية الثورة، شاركت المرأة الشيوعية بنشاط في الثورة. في المجال الاجتماعي والسياسي، أخذوا مكانهم كـ SYPG المرأة، و SYPG، و المرأة الأممية الحرة، وأخيرًا كنساء شيوعيات ثوريات (JKŞ). في المجال العسكري، أخذت المرأة الشيوعية مكانها في البداية في YPJ، في تشكيل عملية YPJ، في الكتيبة الدولية مثل MLKP / KKÖ منظمة النساء الشيوعيات، وشاركت في جميع الحملات لتحرير روج آفا. في المجال الاجتماعي، من الصحة إلى الاتصالات، كانت البلديات والكيومونات والمجالس والدفاع عن النفس والأمن موجودة وقدمت عملاً رائعًا. استشهدت نساء شيوعيات شاركن في كل مدينة وحرب إقليمية، واستدعيت وجرحت. أصبحوا جزءًا من الجيش النسائي. من مجال الاغتيال إلى التخريب، من قسم الأسلحة الثقيلة إلى كل ميدان، أصبحت المرأة الشيوعية موضوع ثورة النساء. شاركت النساء الشيوعية والمثليات والمثليين ومزدوجي الميل الجنسي ومغايري الهوية الجنسانية في حرب شنكال وعفرين وكوباني وكانتون سيزر بالتضحية بالنفس. بصفته JKŞ، من كوباني إلى الدرباسية، من حسكة إلى تل تمر وقامشلي، قام بتنظيم أعمال التنظيم بين النساء العاملات وعمل بجد لوضع المرأة في صفوف الثورة. تواصل النساء الشيوعيات عملهن بحماس وشرف بطريقة شجاعة ومجتهدة.



المنتسبة لحزب البعثي يبلغ ١١٠ آلاف. ولكن هنا نقطة أساسية. سواء كان رجلاً أو امرأة، إذا لم يكن عضواً في حزب البعث، فلا يمكنه العمل في أي مؤسسة أو مكان. لذلك، يجب أن يكون أي شخص يرغب في العمل عضواً في حزب البعث. تبدأ النساء بشكل خاص الأنشطة من أجل الحق في الدراسة وفي نهاية هذه الأنشطة يحصلن على الحق في الدراسة. بعبارة أخرى، يمكننا القول أنه منذ بداية إنشاء سوريا وحتى مسيرة ثورة روج آفا، حتى لو كانت هناك بعض المنظمات والنضالات النسائية، فإنها لم تظهر كحركة جماهيرية نسائية تناضل ضد الرأسمالية و ضد هيمنة الذكور. على الرغم من أن الأحزاب الثورية والشيوعية أدرجت حقوق المرأة في برامجها وبياناتها، إلا أنها في الأساس بعيدة كل البعد عن وجهة نظر الثورة النسائية، وبشكل أساسي، فإن الآراء الذكورية هي السائدة داخل هذه الأحزاب. لذلك، حتى لو زاد عدد النساء في هذه الأحزاب، فليس لديهن فكرة أن المنظمة النسائية ستنظم فكرة الطبقة النسائية والنضال بين الجنسين. صفحة جديدة مع ثورة نساء روجا لا يمكن كتابة تاريخ النضال من أجل حرية المرأة إلا من خلال منظمة أيديولوجية وسياسية. لذلك، لم تستطع الحركة النسائية السورية إنشاء منظمة على هذا الخط. يمكننا القول أن أول احتجاج نسائي ضد النظام وهيمنة الذكور كان ممكناً مع الحركة النسائية الكردية. النضال الذي أحدثته المرأة الكردية أدى إلى تنوير المرأة بالمعنى الكامل للكلمة. أخذت الحركة النسائية الكردية هنا زمام المبادرة في تنظيم النضال بين الجنسين للنساء من الدول الأخرى أيضاً.

قام شعب روج آفا، بقيادة المرأة، بثورة ديمقراطية وأسس نظاماً لحرية المرأة. بعد تشكيل الثورة النسائية، تم إنشاء المنظمات النسائية المستقلة، والإعلان عنها واتخاذ خطوات مهمة في مجالات الجيش والدفاع والعمل الاجتماعي والثقافة والدبلوماسية

ممثل الهيمنة الذكورية البعث إذا أجرينا بحثاً حول التاريخ السياسي لسوريا، فمن الصعب جداً العثور على بيانات عن تاريخ الحركة النسائية. لا يوجد اسم للمرأة في المصادر المكتوبة. كما هو الحال مع جميع تواريخ الأنظمة الرأسمالية الأبوية، هناك اتجاه للهيمنة الذكورية. لم يشر ممثلو الأفكار الثورية والشيوعية والديمقراطية واليسارية في كتابة تاريخ المرأة بسبب عنف النظام وقمعه، وبسبب بعد النضال من أجل حرية المرأة. على الرغم من زيادة عدد النساء في هذه المنظمات، إلا أنه لم تكن هناك روح أنثوية مستقلة. في البرنامج السياسي البعثي، أحكام مثل حق المرأة في الانتخاب، والحق في التعهد والتمثيل والتنظيم. لكن الحق في الحرية كان دائماً يتعرض للعنف والتعذيب. كما تم تقييد الحقوق التي تم تضمينها رسمياً في البرنامج بطرق مختلفة. في البداية، خلقت الدولة البرجوازية والأبوية للقومية العربية التابعة للبعث نظاماً سياسياً وأيديولوجياً أعاق تنظيم حركة نسائية واثقة من نفسها. طبقاً للطبقة والأمة والمذهب، فقد طبق تقسيم النساء كسياسة أساسية. بين النساء، بسبب قضايا نقص الدعم الجنساني، لم يتم تشكيل وحدة سياسية أو حركة نسائية بسبب قضية القيادة والقيادة الثورية. حتى لو فرض عنف الدولة والرجل على النساء، لم يتم تطوير صراع بين الجنسين ضد هذه المعرفة. ضد اضطهاد فرنسا في الستينيات، اندلعت انتفاضات سياسية إسلامية في دمشق وحماة ومدن أخرى، واحتلت النساء مكانهن في هذه الانتفاضات. مرة أخرى، تأخذ النساء مكانهن في الحرب ضد إسرائيل. ولكن في كل هذه الحروب، كانت النساء وراء الجبهة، واللوجستيات، والمساعدات الإنسانية. تجري

تم الحصول على حق التصويت والمشاركة في الانتخابات عام ١٩٤٧. في الثمانينيات وردت معلومات في مصادر الجمعية اللبنانية الأمريكية عن أن عدد النقابات النسائية

سلطة دومند واتحاد النساء والرجال

معًا. هنا أيضًا ، التحالف الرئيسي للثورة النسائية هو الجنس الذكري. هذه القضية هي أهم واجبات الشيوعيين ، وخاصة الشيوعيين الذكور.

